



# DI GUHÊN ZAROKAN DE BORÎ BICÎHKIRIN

## Enflamasyona (iltîhaba) guhan tiştêkî normal e

Enflamasyona guhan gelek caran di dema ku zarok serma girtibin peyda dibe û yek ji wan sedemên herî normal e ku zarok diçin cem doktor. Her weha bebik jî dikarin bi nexweşîya enflamasyona guhan bikevin.

Du cûre enflamasyonên guhan hene; enflamasyona guhan ya acîl (akut mediaotit) û di nivê guhan de avî peydabûn (sekretorisk mediaotit). Herdu cûre nexweşî jî gelek cara bi xwe rehet dibin lê hin caran û taybetî jî li cem zarokên piçûk pêwîstiya tedawîyê heye. Navenda lênêrîna sihetê dikare tawsîyeyan bike û biryar bide da ku pêwîst e çi bê kirin.

## Çima li cem hin zarokan êşa guhan zêde peyda dibe?

Li cem hin zarokan enflamasyona guhan ya acîl yan jî di navenda guhan de peydabûna avîyê bi demên dirêj li dû hev gelek caran peyda dibe. Lêkolîner bi ewleyî nizanin gelo çima wisa dibe. Teorîyên ku dibêjin wergirtina nexweşîya enflamasyona guhan dikare irsî (genetîk) be, hene. Her weha li gora hin lêkolînan jî guh heta ku mirov bibe çar salî nagihîje sewîyeya tam gihiştî û ev yek dikare xwediyê maneyek be ji bona van nexweşîyan.

## Çima di guhan de borî tîn bicîhkirin?

Her sal nêzî guhên 10000 guhên zarokan de borî li perdeya wan de tîn bicîhkirin ji bona ku pêşî li enflamasyona acil bèn girtin û bihistin baştir bibe.

Dema ku guh baş bibe hewa ji perdeya guh tê navenda guhan. Di dema enflamasyona guhan de perdeya guh diwerime û loma jî hewayê nade guh. Borîya plastîk ya piçûk loma tê bicîhkirin da ku hewa bikeve navenda guh.


Dema ku avî di guh de peyda bûbe karê ku ev borî dibe hewa xistina navenda guhê ye û bi vî awayî jî navenda guhê zûwa dibe û bihistinê baştir dibe. Di nexweşîya enflamasyona acil de borî

zextê di navenda guhê de kêmtir dibe û bi vî awayî avîyê derdixe derve û êşa di guh de kêmtir dibe.

## Borî alîkarî dibe?

Bicîhkirina borî di guhên zarokên ku di navenda guhên wan de avî peyda bûye û ji sê mehan zêdetir dom kirîye dibe alîkar da ku zarok baş bibihîsin. Ev tişt bi lêkolînan ve hatîye tespîtkirin. Her weha lêkolînen di vî warî de hatine kirin nîşan dane ku zarok ji vê tedawîyê bi awayeke giştî rehet dibe û xwe baş his dibe.

Dema ku di navbera şeş mehan de ji sê caran zêdetir enflamasyona guhan ya acil peyda bibe, lêkolîner baş nizanin gelo borî di guh de bicîhkirin tesîrekê dibe yan na. Mîmkin e ku êşa ji ber enflamasyonê kêmtir bibe lê ev yek bi lêkolînen zanistî nehatîye tespîtkirin.



## Mirov dikare tevî borîyê di guh de serê xwe bişo?

Mirov dikare bi borîyê di guh de serê xwe bişo yan jî avjenîyê bike ji ber ku lîstikên di nav avê de di rewşên normal de rîska enfeksiyonê di guhan de zêde nake. Parêzera guhan, kuma avjenîyê yan jî tapeya guhan ne pêwîst in. Lêkolîn nîşan dane ku dermana guhan piştî serê xwe şuştinê yan jî avjenîyê ne xwediyê tesîreke dîyar e. Ev tişt jî bona demên ku mirov normal serê xwe dişo yan jî avjenîyê dibe derbas dibe. Bi bin avê ketin nehatîye lêkolînkirinê.

## Çima di dema ku bi borîyê tedawî bibin ji guhê mirov avî tîn?

Gelek caran dema ku borî li guh hatibe bi cîh kirin ji guhê mirov dem bi dem avî diherikin. Sedema van avîyan ew e ku di guh de enfeksiyonêk nû peyda bûye. Ji deherewşan heşt caran dîyar bûye ku ji herikîna avîyê zêdetir nîşanek din ya nexweşîyê dîyar nabe. Di du rewşên jî dehan jî dîyar bûye ku nîşanên mîna bilindbûyîna agir, êş û kêmbûna bihistinê peyda dibin. Doktorên ku tedawîyê dikin dikarin tawsîye û agahdarîyên li ser enfeksiyonên nû bidin.

Nivîs: Johanna Thorell, Enformatorê tibbî yê SBU  
Wêne: Lena Forsman

Kontrola faktayê: Professor Sten Hellström, Nexweşxaneyê Unîversîteyê ya Karolînskayê (Karolinska universitetssjukhuset, Stockholm) û Agneta Pettersson, rêvebira projeya SBU.  
Redaktor: Ragnar Levi, Şefê agahdarîyê ya SBU Mafê telifê: SBU

